

Serdan li xaniyên mezinan qedexe ye

Hikûmet dixwaze ku mirovên kal û pîr biparêze ku bi vîrûsa Korona ve têk bibin. Hemo serdanên xaniyên mezinan(äldreboenden) li seranserê Swêdê naha hatine qedexekirin.

Ji 1ê Nîsanê ve, qedexe ye ku serdana hemo heval û xizmên li hemo xaniyên mezinan(äldreboenden) li Swêdê. Hikûmetê wê biryar da. Ji ber ku mirovên mezin werin parazkirin ji vegirtina vîrûsa Korona. Tirs pir mezine ji bo kesên ji 70 salî mezintir, an ji wan yê nexweşiyên giran (yên veşartî) bi wan re hene. Bi qedexekirina serdanên li xaniyên mezinan(äldreboenden), hûn wan diparêzin.

Divê mirovên mezin yê li malê dijîn bi mirovên din re hevdiîtin nebin. Xizm û heval dikarin alîkariyê bikin bi riya telefonê ji bo kirrîn û axaftinê. Heger hûn pir bi hev re dijîn di yek malbatê de, pir başe ku yê din di malbatê de, gelek têkiliyên civakî tunebin, û hûn bi hevûdu re nêzîk hev nabin. Girîng e ku destên xwe pir û pir baş bişon û yek mitre

dûr hev bigirin.

- Ger her kes berpirsiyariyê xwe bigire, em dikarin rewşê bi awayek baştir derbas bikin, Lisa Labbé Sandelin dibêje, bijîjkek kontrola enfeksiyonê li wîlayeta Kalmar. Ew bandor li her kesî dike, lê her kes dikare alîkariyê bike.

Pir pirov kê werin wergirtin

Hikûmet her weha biryar stand ku divê Swêd ji bo covid-19, û vîrûsa Korona, bi bêtir pirov werin wergirtin.

Yekemîn, nexweş û kesên li nexweşxaneyan da werin kontrolkirin. Piştra yê din ên ku bi civakê re girîng dixebitin kontrolbibin.

Piştî vê jî gerek kesên din yê ko Korona bi wan ra hebû û jê paraz bûn werin kontrolkirin. Desteya Tenduristiya Gel (Folkhälso-myndigheten) re kar tê xwestin ko destpêkirina xebatê û piştrastkirina wê tê dayîn.

Vegirtinadilopî:

Covid 19 vegirtinekdilopî ye. Vîrûs bi xaziyê belav dibe, pir biçûke, mîna dûman li ser neynikê, an wek ewrek dema ku nefesê di hewayek sar de berdide.